



Mafê xwe nas bike!

Agahdarî ji bo penaberên jin

Bernameya teşwîqkirinê „Întegrasyon bi rêya Kuwalîfîyebûnê (IQ)“

Kurmanci

Çap

Weşanger:

Tora IQ ya Saksonya Jêrîn (IQ Netzwerk Niedersachsen)

Beşprojeya „Fokus Flucht (Fokus Penaberbûn)“

Flüchtlingsrat Niedersachsen e.V.

(Komeleya Meclîsa Penaberan a Saksonya Jêrîn)

Röpkestraße 12

30173 Hannover

www.nds-fluerat.de

www.netzwerk-iq.de

www.migrationsportal.de



Redaksiyon:

Vivien Hellwig, Flüchtlingsrat Niedersachsen e.V.

Rûpelsazî:

Vivien Hellwig, Flüchtlingsrat Niedersachsen e.V.

Marion Simmering, RKW Nord GmbH, IQ Netzwerk Niedersachsen

Illustrationen:

© Hanna Katrin Krümpfer

Hatiye amadekirin: Gulana 2017'an

Bernameya teşwîqkirinê „Întegrasyon bi rêya Kuwalîfîyebûnê (IQ)“ ji xwe re dike armanc ku întegrasyona bazara kar a mezinên koçber bi awayekî mayînde baştir bike. Bername bi desteka madî ya Wezareta Federal a Kar û Cîvakî (BMAS) tê teşwîqkirin. Di bicihanîna bernameyê de Wezareta Federal a Perwerde û Lêkolînê û (BMBF) û Saziya Federal a Kar (BA) hevkarên projeyê ne.

Wezareta Federal a Kar û Cîvakî bernameya teşwîqkirinê „Întegrasyon bi rêya Kuwalîfîyebûnê (IQ)“ destek dike.



Wezareta Federal a
Kar û Cîvakî

Bi hevkarîya:



Wezareta Federal a
Perwerde û
Lêkolînê



Saziya Federal
a Kar

Agahdariyên ji bo jinên penaber

Dîmenê penaberan di minaqeşeya heyî de bêhtir mêrane ye. Lê belê li Elmanyayê hema hema ji her sê penaberan yek jin e. Jin li ser rêya penaberiye, di asteke bilindtir de şidetê tecrûbe dikin, rastî êriş û tacîzên cinsî tî, dibin mexdûrên trawma û jihevqutbûna malbatê. Gelek jin, ji ber zor û zexta li dijî jinê ji welatê xwe penaber dibin. Cudakeriyê pirralî û tecrûbekirina şidetê mixabin li sînorên ti welatan nasekinin. Li Elmanyayê jî jin rûbirûyî şidet û cudakeriyê dibin. Ji ber vê jî ev girîngtir dibe ku weke jin mirov mafê xwe nas bike û zanibe ka mirov li ku dikare li alîkariyê bipirse.

Komeleya Meclîsa Penaberan a Saksonya Jêrîn (Flüchtlingsrat Niedersachsen e.V.) di wê yekê de dikoşe ku di civakê de maf ji bo her kesî wekhev bin û nexasim jî ji bo parastina penaberan têdikoşe.

Bi beşprojeya IQ „Fokus Flucht“ Komeleya Meclîsa Penaberan a Saksonya Jêrîn nexasim jî dixwaze piştgiriye bide jinên penaberan di jiyana wan a li Elmanyayê de. Kuwalîfîyebûn û Zanîn beşeke girîng a wê yekê ne ku mirov bi jiyaneke mirovî bi xwe diyarkirî û xweser rabe.

Komeleya Meclîsa Penaberan a Saksonya Jêrîn hevkarê projeya Tora IQ ya Saksonya Jêrîn e. Ev broşur di çarçoveya hevkarîyê de hat bipêşxistin, bi wî rengî ku pêşniyazên li jêr, çend lînk û agahî yê elaqedarî eyaleta Saksonya Jêrîn in.

Em van tiştan pêşniyaz dikin:

- Atolye derbarê cihana kar a li Elmanyayê de ji bo jinên penaber
- Atolyeyên vekirî ji bo jinên xwedî serpêhatiya penaberiye (mînak, weke jin mafên we çî ne, doz û pêvajoya penaberiye, Mafên zarokan û wekî din)
- Atolye li ser qebûlkirina pîşeyî ya kuwalîfîkasyonên li derveyî Elmanyayê bi dest hatî anîn
- Destekkirina xwebirêxistinkirina jinên penaber



Peywendî:

Vivien Hellwig, Flüchtlingsrat Niedersachsen e.V.

Röpkestraße 12

30173 Hannover

Telefon: +49 (0)511/98 24 60 30

Hejmara yekser a telefonê: +49 (0)511/85 03 34 90

E-mail: vh@nds-fluerat.org

Gelo pêdiviya we bi alîkariyê heye?

Berê xwe bidin şêwirgeheke li cihê cih. Şêwirgehên li Saksonya Jêrîn hûn dikarin li ser navnîşana înternetê ya li jêr peyde bikin:

www.nds-fluerat.org/beratungsstellen

Agahdariyên giştî ji bo jinên penaber ji Komeleya Meclîsa Penaberan a Saksonya Jêrîn li ser vê malperê ne: **www.refugee-women.de**

Telefona Hewara Jinê:

0800/0 116 016 (bê pere ye, anonîm e, bi gelek zimanan heye)

Telefona krîzê ya Saksonya Jêrîn a LI DIJÎ zewaca bi darê zorê:

0800/0 667 888 (bê pere, anonîm)

Telefona Hewarê ya „Jinên Ducanî di rewşeke hewara lezgîn de“ ya hikûmeta federal:

0800/40 40 020 (bê pere ye, anonîm e, bi gelek zimanan heye)

Doza penaberiye

Îfadeya devkî beşa herî girîng a doza penaberiye ye. Pîrraniya caran zehmet e mirov behsa sedemên penaberiye bike. Lê belê zehmet jî be hûn pê biêşin jî – girîng e ku hûn hemû sedeman bê kêmasî di îfadeya xwe de bibêjin. Hûn dikarin bixwazin ku agahiyên we dayî, neqlî kesên din – her weha kesên ji malbata we jî – neyên kirin!

Ew bi kêr tê û alîkar e ku beriya îfadeya devkî ya li cem Meqamê ji bo Koçberî û Penaberiye yê Federal (BAMF) hûn biçin şewirgehekê. Di şêwrê de hûn dikarin xwe ji bo îfadeya devkî jî amade bikin. Dema hûn çûn îfadeya li BAMFê hûn dikarin bikin ku kesek weke „alîkar“ refaqetê bi we re bike.

Mafê we ye ku hûn ji bo xwe, bi sedemên xwe bi xwe, doza penaberiye fermî bikin – hûn bi malbata xwe re penaber bûbin jî. Dema doza penaberiye bi hev re be, hûn ê bi tena serê xwe îfadeyê bidin.

Hûn dikarin bixwazin ku kesa îfadeya we digire û kesa wergerê dike jin bin.




Zor û zilma ji ber cinsiyeta we dikare sedemek be ji bo biryareke di doza penaberiya we de. Şidet û zora di nava malbatê de jî dikarin sedemên penaberiyê bin.

Weke jinên ducanî, dayikê bi tena serê xwe zarokên temenê wan di bin 18 salan de mezin dikin, weke kesên rastî êşkenceyê, destavêtina cinsî yan jî rengên din ên şideta fizîkî, derûnî û cinsî hatibin, mafê we heye ku hûn doza piştgiriyeke taybet bikin. Her weha zarokên (bê refaqet) ên temenê wan di bin 18 salan de, mirovên kêmdam û seqet, û kalûpîr dikarin doza piştgirî û alîkariya taybet ji bo xwe bikin. (Qaîdeyên Yekîtiya Ewrûpayê 2013/33/EU û 20011/95/EU)

Berê xwe bidin şêwirgeheke li cihê cih. Şêwirgehên li Saksonya Jêrîn hûn dikarin li ser navnîşana înternetê ya li jêr peyde bikin:

www.nds-fluerat.org/beratungsstellen

Mafên zarokên min çi ne?



Piştî ku hûn neqlî şaredariyekê kirin, piştî ku zaroka we sala xwe temam kir, mafê wê heye biçe dergûşxaneyekê. Piştî ku zaroka we bû sê salî mafê wê heye ku biçe baxçeyekî zarokan. Maf û erka her zarokê – çi kur û çi keç – ye ku piştî 6 saliya xwe biçe dibistaneke.

Alîkarî hene ji bo miqatebûna li zarokan û ji bo dema serbest a zarokan jî pêşniyaz hene. Ji bo dê yan jî bavên bi tena serê xwe zarokan mezin dikin, alîkariyên zêdetir hene.

Berê xwe bidin şewirgeheke li cihê cih. Şewirgehên li Saksonya Jêrîn hûn dikarin li ser navnîşana înternetê ya li jêr peyde bikin:

www.nds-fluerat.org/beratungsstellen

Yan jî berê xwe bidin Tora Dêûbavên Koçber li Saksonya Jêrîn (MigrantenElternNetzwerk Niedersachsen - MEN)

www.men-nds.de



Li hemberî şideta li dijî min yan jî zarokên min, ez dikarim çi bikim?

- Nabe ku şidet li dijî mirovekî bê bikaranîn, çi jin, çi mêr û çi zarok; nabe ku zora peywendiya cinsî li mirovekî bê kirin.
- Li stargehê, di zewacê de, di nava malbatê de yan ji bi destê hevalan, şidet qedexe ye.
- Şidet li cihê kar û li meydana gelemperiyê qedexe ye.
- Sinetkirina keçan û jinan li organên wan ên cinsî li Elmanyayê tê cezakirin.
- Nabe ku kesek li ser jinekê, mêrekî yan jî zarokekê fuhûş ferz bike.

Li van navnîşanên li jêr hûn dikarin xwe bigihînin alîkariyê: Telefona Hewara Jinê: **0800/0 116 016** (bê pere, anonîm, bi gelek zimanan) Ti tişt ji ti kesa din re nayê gotin, hûn ne mecbûr in navê xwe bibêjin û heta hûn erê nekin wê ti tişt neqewime. Mirovên li ser vê xeta telefonê dikarin bi gelek zimanan bipeyivin. Wekî din stargehên jinan hene ji bo parastina jinan.

Zewaca we ne bi dil û daxwaza we ye?

- Li Elmanyayê hûn ne mecbûr in ku ji ber zora li we tê kirin bizewicin.
- Heger hûn naxwazin, hûn ne mecbûr in bi kesekî re bizewicin.
- Gelo ne bi dil û daxwaza we biryar tê dayîn ka hûn ê bi kê re û kengî bizewicin?
- Hûn dixwazin ji zewaca xwe birevin, lê hûn nizanin çawa?

Heger wisa ye, li navnîşanên li jêr hûn dikarin xwe bigihînin alîkariyê: Telefona krîzê ya Saksonya Jêrîn LI DIJÎ zewaca bi darê zorê: **0800/0 667 888** (bê pere, anonîm) Elmanî û Tirkî, heger pêwîst bike bi Farsî, Erebi û Kurmancî jî heye.

Dema devjihevberdana jin û mêt, çi bi mafê min ên îqametê û mana li Elmanyayê tê?

Heger we bi xwe weke penaber mafê parastina penaberiye wergirtibe, hingê mafê we yên îqamet û mana li Elmanyayê heye û ne girêdayî yê hevjinê we ye. Ji bo mafê we yê mana li Elmanyayê ne girîng e ka hûn ji hev qut dijin yan bi hev re dimînin. Her weha xizmên kesên penaberiya wan fermî qebûl bûye jî bi rêya penaberiya malbatê, dibin xwedî mafekî xweser ê îqamet û mana li Elmanyayê.

Hûn di ser hevjinê xwe re hatin Elmanyayê û dixwazin jê veqetin?



Weke qaîdeyê sereke, hevjinê ku di ser hevjinê xwe re hatî Elmanyayê, piştî devjihevberdanê dibe xwedî mafê xwe yê îqamet û mana li Elmanya yê xweser, heger beriya devjihevberdanê jiyaneke zewacê ya herî kêrmasî salan bi hev re bihurandibin.

Heger beriya sê salan hûn dev ji hev berdin, hingê bi tenê ji ber sedemên cidî û giran mafê îqamet û mana li Elmanyayê dikare bê dayîn. Ev sedem dikarin weke nimûne ev bin: Şideta navmalê li we û zarokên we tê kirin, yan jî weke jineke dev ji mêtê xwe berdayî dema hûn vegerin welatê xwe muhtemel e hûn bîrê tepisandin û rastî zordariyê werin.

Beriya biqewime, berê xwe bidin şewirgeheke li cihê cih. Hûn dikarin şewirgehan li ser malpera li jêr peyde bikin:
www.nds-fluerat.org/beratungsstellen

Têkiliyên di navbera du kesên ji heman cinsî de û transseksuwalîte

- Li Elmanyayê destûra wê heye ku têkiliya mirovî bi miroveke/î ji heman cinsî re hebe.
- Di doza penaberiyê de zilm û zordariya giran a ji ber homoseksuwalîteyê bi taybetî li ber çavan tê girtin.
- Ji ber tercîha xwe ya cinsî hûn rastî cudakeriyê tên?
- Pêdiviya we bi alîkariya zêdetir heye weke homoseksuwal yan jî transseksuwelekê/î?

Li vê navnîşana li jêr hûn dikarin xwe bigihînin alîkariyê:

www.queer-refugees.de

www.queer-refugees-niedersachsen.de

Tenduristî û nexweşî

Di rewşa hewarê de timî mafê we heye hûn biçin cem bijîşkekê/î – kaxezên we yên fermî nebin jî. Hejmara telefonê ya ji bo hewara tibî ev e: **112**. Mafê we heye ku hûn tibî werin dermankirin ji ber nexweşiyêke bedenî yan jî derûnî. Xebatkarên civakî dikarin di gera we ya li bijîşkekê yan jî bijîşkekê de bi we re alîkar bin. Ji bo xizmetên ji van û wêde, divê miracaetêke fermî bê kirin.

Heger kaxezên we yên fermî yên îqamet û mana li Elmanyayê nebin, hûn dikarin li navnîşanên li jêr xwe bigihînin alîkariyê: **www.medibueros.m-bient.com** yan jî li cem **Malteser Migranten Medizin Hannover**, **www.malteser-hannover.de**, **0511/169 54 30**

Di rewşa trawmatîzêbûyînê de Tora ji bo Penaberên Trawmatîzêbûyî li Saksonya Jêrîn (Netzwerk für traumatisierte Flüchtlinge in Niedersachsen e.V. -NTFV) dikare bi we re bibe alîkar: **www.ntfn.de**, **0511/856 44 510**

Ducanîbûn

Weke miroveke ducanî pêdiviya we bi miqatebûn û parastîneke taybet heye. Doza piştgirî û alîkariyê bikin ji bo hewandin û lêmiqatebûneke guncaw. Di dema ducanîbûnê de û piştî wê mafê we yê lêmiqatebûneke taybet a tibî heye. Beriya û piştî hatina dinê ya zarokê mafê we ye ku pîrikek alîkariyê bi we re bike. Gelo hûn ducanî ne û pirsên we hene? Gelo pirsgirêkên we yan jî tirsên we ji ber ducanîbûnê hene?

Telefona alîkariyê ya „Jinên ducanî di rewşa hewara lezgîn de“ ya hikûmeta federal:

0800/40 40 020
(bê pere, anonîm, bi gelek zimanan)



Li Elmanyayê karkirin

Girîng e ku hûn biçin kurseke zimanê Elmanî. Hûn karibin bi Elmanî bipeyivin rewşa we rehet dibe li kar, di şagirtiya pişeyî yan jî di xwendina zanîngehê de. Kursên zimanê Elmanî hûn dikarin li navnîşana li jêr peyde bikin: www.fluechtlinge.niedersachsen.de

Di dema dewamkirina doza penaberiyê de û bi mafê manê yê demkî (Duldung) ji bo ku hûn karibin kar bikin, divê meqamê ji bo biyaniyan destûrê bide we. Mafê we heye ku hûn bêtê destûra hevjinê xwe kar bikin. Mafê jinan e ku weke mêran hesabekî wan ê bankeyê hebe.



Gelo li derveyê Elmanyayê hûn fêrî pişeyekî bûne? Heger erê, hûn dikarin bikin ku dîplomayên we yê pişeyî li Elmanyayê bên qebûlîkirin. Gelo we li welatê hûn jê tî zanîngeh xwendiyê? Gelo hûn dixwazin li vir biçin zanîngehê, yan jî hûn neçar mabûn ku hûn xwendina xwe ya zanîngehê nîvco bihêlin? Derfet hene ku hûn li Elmanyayê zanîngehê bixwînin. Ji bo agahdariyan binihêrin li: www.migrationsportal.de/studieren-in-niedersachsen oder www.migrationsportal.de/arbeiten-in-niedersachsen

Hûn dikarin li Elmanyayê kar bikin heger ti perwerdeya we ya pişeyî nebe jî. Şêwirgeh hene ku di gera we ya li karekî yan jî gera we ya li perwerde û şagirtiyeke pişeyî de bi we re dibin alîkar. Heger we ti dibistan neqedan-dibin, ji bo ku hûn dîplomaya dibistanekê bistînin, hûn dikarin biçin dibistanê yan jî hin kursan.

Wenn Sie arbeiten, haben Sie ein Recht auf Ihren Lohn und auf Schutz bei der Arbeit - auch ohne schriftlichen Arbeitsvertrag. www.faire-mobilitaet.de

Berê xwe bidin şêwirgeheke li cihê cih. Şêwirgehên li Saksonya Jêrîn hûn dikarin li ser navnîşana înternetê ya li jêr peyde bikin: www.nds-fluerat.org/beratungsstellen/ Şêwirgehên qebûlîkirin û kuwalîfikasyonê yê Tora IQ ya Saksonya Jêrîn: www.migrationsportal.de/projekte-partner/anerkennung-und-qualifizierungsberatung

Ez dikarim li ku bi jinên din re bicivim?

Li Elmanyayê mekan hene ku bi tenê ji bo jinan in. Her wiha kurs û tem-rînên sporê jî hene ku bi tenê ji bo jinan in. Li van deveran hûn dikarin bi jinên din re bên cem hev û bi wan re bidin û bistînin. Li cihê xwe li gehwexaneyên jinan yan jî civînên taxê yên cîranan.



Her wiha komên jinan ên penaberan ji bo penaberan hene. Ew xwe angaje dikin ji bo jiyanekê baştir a jinên penaber hem li vir û hem li welatên din, mînak, woman in exile yan jî international women's space. Ji bo agahdariyan binihêrin li:

www.women-in-exile.net; www.iwspace.wordpress.com

Komeleya Meclîsa Penaberan a Saksonya Jêrîn

Em kî ne

Komeleya Meclîsa Penaberan a Saksonya Jêrîn (Flüchtlingsrat Niedersachsen e. V.) komeleyeke ji bo xizmeta giştî ya civakê ye ku sala 1984'an hat damezrandin. Em toreke serbixwe ne ya ku pêk tê ji inîsiyatîfên penaberan, yekîtiyên xweşhaliya civakî, cemaetên dêran, sendîqe û ferdan.

Em doza çi dikin

Komeleya Meclîsa Penaberan a Saksonya Jêrîn alîgirê wê yekê ye ku her mirovê ku jiyana wî sereke û para bêhtir li Elmanyayê ye, bibe xwedî mafê îqamet û manê û di heman demê de di warê hiqûqî de wekhev bê dîtin. Em angaje ne ji bo pêvajoyê dozeke adilane ya penaberiya û em hêza xwe ji bo wê yekê didin ser hev ku ji destpêkê ve mirovên penaber bibin xwedî derfetên beşdariya civakî û perwerdeyê û karibin kar bikin.

Em destekê didin penaberan bêyî ku li statuya wan binihêrin û tevî wan em têdikoşin ji bo danqebûlkirin û parastina mafê wan.

Komeleya Meclîsa Penaberan a Saksonya Jêrîn ji sala 2016'an ve weke hilgirê beşproje ya Tora IQ ya Saksonya Jêrîn di bernameya teşwîqmirinê ya „bi Kuwalîfikasyonê Întegrasyon (IQ)“ dixebite.





www.migrationsportal.de
www.nds-fluerat.org

Bernameya teşwîqkirinê ya „bi Kuwalîfiyebûnê Întegrasyon (IQ)“